

revolution in the making

Konferansa 1emîn, 6-7 Cotmeh 2018, Frankfurt



Network
Women
Weaving
the Future

Danezana Encamnameyê

1'emîn Konferansa Jinan ya Navnetewî "Revolution in the making" (şoreş di avakirinê de)

Em di vê zanêbûnê de ne ku pergala bavixsalarîyê, şerekî cîhanî li hemberî jinê dide meşandin. Bi hezaran sal me bi awayên cîhêreng li hemberî bavixsalarîyê têkoşîn daye. Ji ber ku em ji her demê zêdetir jiyana azad û wekhev pêşdixînin û amûrên pêkanîna wê mezin dikin, pêla şerê kurewî yê li hemberî jinan pêş dikeve û êrîşî destkeftiyên me dike.

Tu bizanibe! Her tiştî ku ya me ye, em ê dîsa werbigirin: hêza me û azadiya me. Li gel vê hovîtiya ku bavixsalarîyê em pê re rû bi hiştine, em ê bi ser bikevin.

Rûyên cûda yê şerê kurewî yê li dijî jinan tê meşandin hene. Nijadperestî, dagirkerî, kapîtalîzm û bavixsalarî bi gelek awayan bi hev re tifaqê çêdikin; Carinan ew di kesayetên mîna Erdoğan, Duterte, Mondî, Putin û Trump teşe digirin ku bi awayekî vekirî dijmintiya jinan dikin. Ji ber ku nijadperest in û hêzên bavixsalar dixin nav tevgerê ji bo deshilarî bi yekdest û navendî be û xwezayê xira dikin ji bo hejmareke biçûk a mirovan dewlementir bibe.

Derveyî vê, li cihên mîna El Salvador, Guatemala û Honduras mafya xwe bi rêxistin dike, li Afxanistanê yekdestên şer (warlords) li ser deshilarîyê ne. Li Îranê dadgehên dewletê hene ku cezayê kuştinê li jinan dibirin, li Ewrûpa û DYê parastina sînor heye. Bazirganiya seksê hem li Ewrûpa hem li Afrîkayê heye. Li Rojhilata Navîn, DAÎŞ û çeteyên cîhadî yên bavixsalarî ên wek wê hene.

Li her dera cîhanê, kapîtalîst hene ku keda jinê dixwin, çeteyên wan ên jinan direvînin û dest davêjin wan hene. Kuştinên li ser navê namûsa qaşo pêk tên û "sûcê bah", suneta jinan û "destavêtina dost û evîndaran" hene; bi van yekan jin ji aliyê kesên herî nêzî xwe ve, tên birîndarkirin, şikandin û kuştin. Derveyî vê jî dewlet û dadgeh hene ku sûcdaran diparêzin û ceza li jinan dibirin.

Tevî vê û ji vê girîngtir, jin hene. Çalakvanên mafê mirovan, femînîst, şerker, siyasetmedar, milîtan... Li Yemenê li gel hemû zehmetiyan, jinên ku hewl didin zarokên xwe bidin jiyîn hene, li Misirê jinên li hemberî feraseta tundiyê û desthilatdariya yekdestiyê li ber xwe didin hene. Di nava civaka Êzdî de, li gel dîlgirtin û destdirêjiyê, jinên ku dixwazin aştiyê li cîhanê û di nava civakê de mayînde bikin hene. Li Balkanan hewl didin ji bo aştiya di nava civaka xwe de û gelemperiya cîhanê, li Arjantînê xwe bi rêxistin dikin û yekitiya xwe ava dikin. Jinên penaber ên Sûriye, Lîbya, Emêrikaya Navîn û Rojavayê Afrîkayê hene ku hewl didin xwe û malbatên xwe bigîhînin cihên bi ewle. Jinên Zapataîsta yên li her qadê têdîşin û ji nû

ve ava dîkin hene. Dîsa li Rojavayê Kurdistanê, jinên ku şoreşê dîkin û xeyala cîhaneke dîtir bilind dîkin hene.

Tevî van rêyên cihêreng, em bi hev re dihûnin paşeroja xwe.

Ev in ku dibêjin "Black Lives Matter" (kurdî "Jiyana Reşikan Girîng e") û "me too" (kurdî "Ez jî"), ev in ku dibêjin ku yekî ji me kême nebe, ji qedexekirina kurtajê re Na û tu ne bi tene ye. Û yên ku dibêjin, dibe ev tu bûya.

Dem hatiye ku mirov fême bike, mane bide, hîs bike û piştgiriyê bide wan têkoşînên jinan ên cihêreng. Di serî de girîng e ku mirov xwe tevî vê têkoşînê bike!

Ev dû rojên dawî zêdetirî 500 jin, em ji her deverê cîhanê hatin Frankfurtê û tevli gotûbêjan bûn. Di mijarên wek em ê paşerojan çawa bihûnin û çawa piştgiriyê bidin şoreşa jinê ya qonaxa avakirinê de, me niqaş kir. Wek gelek beşdarên konferansê pêşniyar kirin; divê em xwe bi rêxistin bikin, bibin xelek, tewna xwe ava bikin, têkiliyên xwe xurt bikin û bi hev re rêxistinbûna xwe ava bikin. Divê em Konfederalîzma Demokratîk a Jinên Cîhanê bikin. Em ê vê Koferansê û tevna ku çêbûye wekî gava despêkê bigirin dest.

Ji bo dawîkirina Konferansê em destnîşan dîkin ku em ê têkoşîna xwe ya hevbeş ji bo azadiya her yek ji me û me hemûyan berdewam bikin. Em ê destûr nedin ku jinek birîndar bibe. Em ê di cenga li dijî bavixsalariyê de bi serkeftî bin. Em ê saziyên nû yên civaka nû ya azad biafirînin. Em destnîşan dîkin ku şoreş di qonaxa avakirinê de ye, qeyrana kapîtalîzmê encama hewildanên me ye û niha – roja îro – derfetên dîrokî yên serdemê hene ku sedsala 21'emîn vebiguhere sedsala jinan û gelan.

Mîna yek ji axaftvanan anî ziman: "Em mîna JIN dixwazin ku JIYAN li ser bingeha AZADÎ'yê be."

Werin em dengê xwe bikin yek, kulmên xwe rabikin û bang bikin NI UNA MENOS, ELE NAO, BLACK LIVES MATTER û JIN JIYAN AZADÎ!

Network Women Weaving the Future